
Mukaddime, 2017, 8 (Özel Sayı 1), ö207-ö209
doi: 10.19059/mukaddime.366499

**Melay Cizîrî Şitêk Derbarey Jiyan û Berhemî,
Îzedîn Mistefa RESÛL, Hewlêr: Çapxaney Darul Hîkme bo Çapkirdin û Billawkirdnewe, 1990, 231 rûpel.**




Ev pirtûk ji aliyê Îzedîn Mistefa Resûl ve hatiye nivîsîn û di 1990î de li Hewlêrê di “Çapxaney Darul Hîkme bo Çapkirdin û Billawkirdnewe”yê de hatiye çapkirin. Pirtûk ji 231 rûpelî, destpêkek, 14 beş û çavkaniyan pêk tê. Nivîskar di serî de çend gotar di Radyoya Kurdî ya Bexdayê de derbarê Mela de belav kiriye û pêwîst dîtiye derbarê vî “helbestvanê rêber û binyaddanerê helbesta klasîk a kurdî” de xebateke serbixwe binivîse û wî bide nasandin.

Di bin sernavê “Şitêk Derbarey Jiyanî Mela” de (r. 7-43) (Tiştek Derbarê Jiyana Mela de) çavkaniyên li ser jiyana Mela dinirxîne. Ji bo vê herçend cih bide agahiyên Alexsander Jaba, Qanatê Kurdo, Wezîrê Nadirî, Qaçaxê Mirad û Mîroyê Esed jî tekane çavkaniya wî ji bo van agahiyan *Tarîxa Edebiyata Kurdî* ya Qanatê Kurdo ye. Piştî vê cih dide agahiyên *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Elaedîn Secadî, Mihemed Emîn Zekî Beg, Mela Ehmedê Botî Zivingî û piştî nirxandina van zanyariyan bê ku demeke teqez destnîşan bike digihîje vê encamê ku Melayê Cizîrî di dawiya sedsala 16an û destpêka sedsala 17an de jiyaye.

Nivîskar di bin sernavê “Lêkdanewey Serçawekanî Basî Melay Cizîrî” de (r. 43-53) (Dahûrîna Çavkaniyên li ser Melayê Cizîrî) yek bi yek behsa wan destnivîs û çapên dîwana Melayê Cizîrî dike ku ji wan agahdar e. Di serî de cih dide destnivîsa Seyîd Tehayê Erwasî û vê destnivîsê dide nasandin. Paşê behsa çapa Martin Hartman dike ku di 1904an de li Berlînê hatiye çapkirin. Çapa Mihemed Şefîq Erwasî ya li Stenbolê (1919-1921) wek çapa duyem a dîwana Mela dide nasandin. Çapa sêyem bi navê çapa “Qamişî” dide nasandin, lê zêde agahî li ser vê çapê nade. Piştî vê, çapa Gîw Mukrîyanî dide nasandin ku di 1963yan de li Hewlêrê hatiye çapkirin. Nivîskar diyar dike ku çapeke bêdîrok a dîwanê jî li Diyarbekirê dîtiye ku çapkerê wê Mihemed Dinûrî ye. Herî dawî çapa Mecme‘î ‘Îlmî Kurdî ya 1977an a li Bexdayê dide nasandin ku amadekarê wê Sadiq Behaeddîn Amêdî ye. Lê nivîskar

**Gönderilme Tarihi: 15.12.2017, Kabul Tarihi: 15.12.2017**

zêde pê de naçe û diyar dike ku destnivîsên dîwana Mela gelek in û nirxandina wan xebateke serbixwe dixwaze. Piştî nasandina van çapan cih dide boçûnên hin kesan ku derbarê dahûrîna helbesta Mela de ne. Ji bo vê agahiyên Wezîrê Nadirî, Qanatê Kurdo, Mihemed Şefîq Erwasî û Mela Enwerê Maî vediguhêze. Di vê beşê de herî dawî behsa şerhên kurdî û erebî yên dîwana Mela dike û ciyawaziya destnivîsên cuda yên Mela berçav dike.

Sernavê sêyem "Çîrokî Eşqî Melay Cizîrî" (r. 53-62) (Çîroka Eşqa Melayê Cizîrî) ye û di bin vî sernavî de cih dide wan çîrokên ku li ser eşqa Melayê Cizîrî hatine ragihandin. Li gor nivîskar çîroka eşqa Mela bi tevahî bi helbestên wî ve hatine girêdan. Di vê çarçoveyê de pêşî cih dide wan çîrokên *Mêjûy Edebî Kurdî* ya Secadî ku li ser eşqa Mela hatine ragihandin. Çawa ku di xebata Secadî de hatiye, Resûl jî çîroka evîna Mela û Selmaya keça Melîk Kamil vedigêre. Lê di dawiya vê vegêranê de diyar dike ku li gor zanyariyên Şerefnameyê di maweya jiyana Mela de bi navê Melîk Kamil mîrekî Hesenkeyfê nebûye û Melîk Kamilê Eyûbî di sala 1238an de miriye. Ji ber vê jî vê çîrokê mîna çîrokên din wek berhemeke xeyalî dide zanîn. Piştî vê li ser ragihandina Secadî cih dide çîroka Mela û Sitiya Bisk Kesk. Nivîskar, di çarçoveya zanyariyên Mela Enwerê Maî de ku di destpêka çapa Gîw Mukriyanî de hatine nivîsîn, di rojeke Newrozê de li Medreseya Sor behsa destpêkirina evîna Mela û Selmaya keça mîr dike. Herweha ji bo nîşandana eşq û kelecana Mela jî diyar dike rojekê komeke govendgêran di ber medreseya Mela re derbas dibin û Mela ji ber eşqa xwe ya zêde dest ji nimêjê berdide û diçe di nav wan de direqise. Herî dawî herçend peywendiya wê bi mijara eşqê re nebe jî nivîskar ji şerha Zivingî radigihîne ku dema Zivingî di beyteke Mela de peyva "abî xeşmî" fêm nake di xewa xwe de wateya wê ji Mela dipirse û Mela jê re dibêje "a"ya "abî"yê di wateya "erê" de ye û forma wê ya kurtkirî ye. Bi vî awayî nivîskar van ragihandinan û çîrokan nîşaneya zindîbûna Mela dide zanîn di nav xelkê de.




Îzedîn Mistefa Resûl di bin sernavê "Be Xame, Wêneyekî Melay Cizîrî" de (r. 62-64) (Bi Qelemê, Wêneyekî Melayê Cizîrî) di çarçoveya zanyariyên Celadet Bedirxan, Elaeddîn Secadî û Enwer Maî de behsa portreya fîzîkî ya Mela dike. Di beşa "Qesîdey Ellah seher we Kokirawey Bîrî Mela" de (r. 64-89) (Qesîdeya Elah seher û Komkiriya Hizra Mela) krîtîka qesîdeya "Ellah sehergaha ezel" dike. Ev qesîde herçend di nav dîwana Mela de hatibe bicihkirin jî nivîskar vê qesîdeyê wek berhemeke serbixwe dide zanîn. Di nirxandina vê qesîdeya kelamî-tesewufî de bêtir xwe dispêre zanyariyên *Iqdul Cewherî* ya Zivingî û hin beşên girîng ên vê qesîdeyê vediguhêze û şîrove dike.

Di bin sernavê "Melay Cizîrî û Eşq"ê de (r. 89-107) nivîskar beytên Mela yên derbarê eşqê de şîrove dike. Di bin sernavê "Melay Cizîrî û Rêbazî Hirûfî" de (r. 107-116) (Melayê Cizîrî û Rêbaza Hirûfîtiyê) xwe dispêre zanyariyên şerhên dîwana Mela û li ser wateya herfî ya hin beytên Mela radiweste. Di bin sernavê "Bîrî Felekîy Mela" de (r. 116-120) (Hizra Felekiya Mela) beytên wî yên ku derbarê astronomiyê de ne, kom dike û wan şîrove dike. Di beşa "Cejn û Xerîbî"yê de (r. 121-123) çend beytên ku li ser cejn û xerîbiyê ne, vediguhêze. Di bin sernavê "Şetrinc" de (r. 124) (Kişik) çend beytên Mela vediguhêze ku di wan de peyvên lîstika kişikê

wek keresteyeke helbestî hatine bikaranîn, lê bi raya me pêwîst nedikir ku ji bo du beytan nivîskar beşeke serbixwe terxan bike. Sernavê "Melatî" (r. 124-129) di nav pirtûkê de hatibe jibîrkirin jî di naverokê de hatiye bicihkirin û di vê beşê de jî nivîskar diyar dike ku Mela gelek peyv û çemkên ku peywendiya wan bi xwendin û medreseyê hene wek keresteyeke helbestî bi kar aniye û beytên bi vî awayî rêz dike.

Di beşa "Wêne le Şî'r da û Hendê Layenî Tesewif" de (r. 130-157) (Îmaj di Helbestê de û Hinek Aliyên Tesewifê) cih dide îmajên tesewufî yên helbesta Mela û wan di nav metaforên hevbeş ên edebiyata rojhilata Îslamî de şîrove dike. Nivîskar têgihîştina tesewifî ya Mela di çarçoveya wahdetu'l-wicûdê de şîrove dike û mînakên ku vê hizra wî diselmînin yek bi yek rêz dike. Di beşa "Hendê Têbînî Derbarey Ruxsar" de (r. 157-185) (Hinek Têbînî Derbarê Ruxsarê de) hin agahiyên têkel derbarê ruxsara helbesta Mela de dide, lê ev beş ji aliyê agahiyên xwe ve gelek belawela ye û bi tu awayî wêneyê giştî yê ruxsara helbesta Mela dernaxe holê. Beşa "Cîhanêkî Firawanî Berawird" (r. 185-223) (Cîhana Berfireh a Berawirdiyê) jî mîna beşa pêşî gelek qels e. Di paragrafekê de bi xetên giştî behsa edebiyata berawirdî dike û diyar dike ku Melayê Cizîrî divê digel helbestvanên din ên rojhilatî û kurdî bê berawirdkirin. Diyar e, nivîskar li gor zanyariyên şerhên dîwana Mela di navbera hin beytên Mela û Mewlewî, Hemdî, Nalî, Se'dî, Hafiz, Mutenebî, Enwerî û Xeyam de berawirdî dike, lê ji bilî rêzkirina beytên helbestvanên navborî Resûl tu encameke berbiçav ji vê berawirdiyê dernaxe.



Di encamê de mirov dikare bibêje ku Îzedîn Mistefa Resûl bi vê xebata xwe ji xebatên berî xwe ciyawaztir nekariye tiştekî ciyawaztir derbarê helbest û helbestvaniya Mela de derxe holê û vekolînên li ser Mela dewlemendtir bike. Şaşiyên rêbazî, kêşeyên polînkirin û biserûberkirina deqê, kêmiya çavkaniyên pêwîst û sînordarnekirina babetê kêşeyên sereke yên vê xebatê ne û bi raya me ji ber van sedeman ev xebat ji taybetiyên xebateke zanistî dûr ketiye.

**Zülküf ERGÜN**
Zanîngeha Mardin Artukluyê
Beşa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
zxweshevi@gmail.com